



**Li gorî qanûnên federal û rêbazên Herêma Niedersachsenê\* li gel bernameya me ya hundirîn ji bo paqijyê û QANÛNA ME YA HUNDIRÎN ev pêwer û yasa misogir in:**

### **Rêbazên seredanê**

Serê her nexweşekî, yek mirova wî bi tenê ya saxlem dikare were hambêz kirin û mafê wê heye, ku li gorî pêkanîna û rêzêgirtina tedbîrên parastinê li nexweşxaneyê de amade be.

Keseke duyem jî dikare di navbera saet 15 û 18 serdana nexweşan bike yan heger rewşeke tenduristî ya awarte hebe.

Ji ber rêbazên dûrbûna mirovan ji hev çênabe tu kesê din were serdana nexweşan bike.

Hemî mirov ji bilî kesê/kesa nexweş divê li ber dergehê nexweşxanê pirsnameyeke pembehî tijî bikin. Ji kerema xwe re bila ev belge li dema mayîna we li nexweşxanê li ba we be û dema ku hun ji nexweşxanê derketin wê belgê dîsa li karmendên nexweşxanê vegehin!

Piştî ku we navê xwe li “Ambulanz- und Aufnahmezentrum” qeyd kir, ji kerema xwe re yekser herin wî beşê, ku divê hun herinê û li wê derê li ba pirsgehê xwe qeyd bikin. Heger pêdivî hebe, dibe ku hun li vê derê karteke derbasbûnê ya kesek ji bo keseke duyem jî bistînin.

### **Erkê bikaranîna maskê**

Hemî kesên ku bi nexweşan re bin, divê li navan nexweşxanê maskê bi kar bînin. Raporta, ku erkê bi kar anîna maskê betal dike, li nexweşxana me NAYÊ qebûl kirin. Mirov dikare maska xwe ji ber xwe bike, heger ew mêvanê kesê nexweş li oda nexweşan li ba zaroka xwe be – heger 1,5 mîtro ji mirovên din di odê de dûr be. Li dema razanê pêdivî nîn e, ku hîç kesek maskê bi kar bîne.

Maskên paçî misogir in, heger paqij bin û ne şil û ter bin û heger bêvilê û devî jî baş bigirin. **Sermal yan çarik û stûmal çênabe bi şûna maskê werin bi kar anîn!**

Ji kerema xwe re hay ji rêbazên paqijyê yê bingehîn hebin, mîna jihevdukbûnê, her gav şuştina destan û rêbazên kuxîn û pişkînê.

\* § 21 Nexweşxane, navendên tenduristî û guhdana pêşlêgir

Kesên nexweş mafên wan heye, ku li nexweşxaneyan û navendên tenduristî û guhdana pêşlêgir li gorî pîvanên bernameyeke paqijiyê ku ji aliyê rêvebiriya saziya peywendîdar ve hatiye danîn, li gorî madeya § 3, mêvanan hambêz bikin. Ew sazî li gorî madeya § 4 divê navûnişan û zaniyariyên taybet yê her mêvanekî û mêvanekê binivîsin û tomar bikin. (Çapa: 14.07.2020)